HDP

# BULTENA ÇANDINIYÊ

- Hilberîna hêkên mirîşkan, li gorî sala 2020'an ji sedî 1,7 kêm bû û daket nêzî 1,5 milyar hêkan.
- Hêjmara mirîşkên hatin serjêkirin, li gorî sala 2020'an ji sedî 8,4 kêm bû û daket nêzî 90.779 mirîşk hatin serjêkirin.
- Hilberîna goştê mirîşkan li gorî sala 2020'an ji sedî 7,1 kêm bû û daket 161.923 ton goşt.
- Hilberîna goştê elokan li gorî sala 2020'an ji sedî 26,6 kêm bû û daket 4.125 ton goşt.
- Di sala 2020'an de îthala goştê mirîşkan 1,413 ton bû. Îxracata goşt jî 439.373 hezar ton bû.
- Goştê mirîşkan di sala 2017'an de kiloya wî 8 lîra bû, îro kilo derketiye 18 lîra.
- Li gorî daneyên Yekîtiya Odeyên Çandiniyê ya Tirkiyeyê (TZOB), ciroya salane ya sewalên bi per û pask nezî 5,5 mîlyar lira bû. Hilberîna goştê mirîşkan li gorî daneyên TUÎK ya li gorî salên berê ji sedî 7,1 kêm bûye.
- Hilberînerên mirîşkan diyar dikin ku dema maliyeta lêçûnê û hatinê didin ber hev, dema şewba mirîşkan pêş dikeve, pêvajoyek pir xerab derbas dikin.

Guhertina Salane ya Sewalkariya Pînikan (Tîrmeh 2021)

| | 2020 | 2021 | Guhertin (%) |
|---|---|---|---|
| Goştê Mirîşkan (ton) | 174.329 | 161.923 | -7,1 |
| Mirîşkên hatin serjêkirin (Hezar Heb) | 99.095 | 90.779 | -8,4 |
| Hêkên Mirîşkan (Hezar Heb) | 1.541.760 | 1.515.794 | -1,7 |
| Goştê Elokan (ton) | 5.620 | 4.125 | -26,6 |

Çavkanî: TEPGE

**Di çandiniyê de mêtîngeriya kedê zêde dibe!**

- Li gorî daneyên TUÎK'ê di meha tîrmeha 2021'an de kesên temenê wan zêdeyî 15+ salî û xwe ji bandora demsalê rizgar kirine û debara xwe dikin, ji % 17,2' di sektora çandiniyê de cih digirin. 17 hezar kesên di sektora çandiniyê de cih digirin zêde bûne. Bi gotinek din 17 hezar kes li dervê qeydan bi awayekî bê ewle kar dikin û debara xwe dikin.
- Di hilberîna çandiniya zeviyan de di hemû qadan de lêçûn û buhayê berhem zêde bûye. Lê yomiya karkeran li gorî vê yekê pir kêm zêde bûye.
- Li herêma Çukurovayê di demsala 2020-2021'ê ya narenciyan de yomîya karkeran rojê 96 lîra bû. Di demsala 2021-2022'an de tenê 18 lîra zêde bû û derket 114 lîrayan.

**Bandora hişkesaliyê didome!**

- Li gorî daneyên FAO di sala 2020'an de li cîhanê hilberîna hingiv 1 milyon û 721 hezar û 288 ton bû. Di cîhanê de hilberîna hingiv Çîn ji sedî 25 ket rêza yekemîn. Tirkiye ji sedî 6,4 ket rêza duyemîn.

.

- Li gorî daneyên TUÎK’ê li Tirkiyeyê 82 hezar û 862 mêşvanan di sala 2020’an de hilberîna hingiv digirin û hilberîna hingiv 4,7 mîlyar lira bû. Li Tirkiyeyê di sala 2020’an de bi buhayê 26 mîlyonî nêzî 6 hezar ton hingiv hat îxrackirin.
- Di sala 2021’an de ji ber hişkesaliyê, dîsa ji ber zelzeleyên xwezayî û şewata daristanan, hilberîna hingiv pir kêm bû.
- Çotkaran di sala 2020’an de piştgiriya tovên bi sertifika, li gel ku salek derbas bû jî hêj negirtine. Lîrayê tirk her ku diçe qîmetê xwe winda dike. Ji ber piştgirîyê nadin çotkaran, çotkar her ku diçe mexdûr dibin.
- Li gori rapora Enstîtuya Derdorê ya Stockholm (SEI), ji ber guhertina avhewayê di hilberîna çandiniyê ya cîhanê de hilberîna şekir û kahwê heta sala 2099’an dibe ku nêvî nêvî kêm bibe.

## Dema bihayên xurekan zede dibe hêza girtinê dikeve!

- Li gorî FAO’yê bihayên xurekan ên cîhanê, bihayên rûnên nebatî, zad û goştê li gorî meha tebaxa sala 2020’an, di tebaxa 2021’an de ji sedî 33 zêde bûye.
- Li gorî daneyên TUÎK’ê ya meha îlonê enflasyona salê ji sedî 19,58 bû. Lê daneyên kuçeyan dide nişandan ku enflasyona salê hîn zêdetir e.
- Li gorî daneyên TUÎK’ê Endeksa Bihayên Çandinî yên Karhat, di Tîrmeha 2021’an de mehane ji sedî 1,98 zêde bûye û salane nêzî ji sedî 29,38 zêde bûye. Di asta salane de bi zêdebûna ji sedî 62,43 zibil pêk aniye.
- Li gorî daneyên Borsaya Bazirganiyê ya Antalyayê(ATB) di meha îlonê de bihayên salane miktara endeksî ya firingiyan ji sedî 10,2 kêm bûye, bihaya endeksî ji sedî 135, salane miktara endeksî ya zerzewat ji sedî 2,9 zêde bûye, endeksiya bihayê ji sedî 80,7,salane miktara endeksî ya fêkiyan ji sedî 15,3 kêm bûye, endeksî ya bihayê jî ji sedî 20,5 zêde bûye.
- Li beramberî daneyên TÛÎK’ê, rêxistinên çewligan diyar dikin ku bihayên karhatan hîn zêdetir bûye. Li gorî daneyên Yekitiya Odeyên Zîraatê ya Tirkiyeyê (TZOB) di dawiya saleke de yek jê girîng a hilberîna çandiniyê ye zibila ureyê ji sedî 146, zibila DAP ji sedî 145, hîn dermanên çandiniyê ji sedî 60, emên xwedîkirinê ji sedî 55, êmên şîr ji sedî 57, bihayên tovên hububat ên sertîfîkayî ji sedî 63 û bihayên ceyranê jî ji sedî 56 zêde bûye.

**Guhertina saleke ya bihayên zibilan**

| Dîrok | Ure | 20-20 | DAP | Sulfat Amonyûm |
|---|---|---|---|---|
| 06/2020 | 1800 TL | 1680 TL | 2250 TL | 940 TL |
| 06/2021 | 4100TL | 3900 TL | 5600 TL | 2400 TL |
| 09/2021 | 5500 TL | 4300 TL | 6900 TL | 3100 TL |

**Çavkanî: Yekitiya Çewligên Edeneyê**

- Li gorî daneyên ku Yekitiya Odeyên Zîraatê ya Tirkiyeyê weşandiye, di meha îlonê de di navbera hilberkar û marketan de cudahiya bihayan 3 qetî derbas kiriye.
- Hilberîkarên pîvazên hişk ku nikarin pereyên karkerên ku berheman li ser erdê kom bikin, bikin, di meha îlonê de cudahiya bihaya di navbera hilbekar û marketan de ji sedî 253 herî zêde pîvazê hişt pêk aniye.
- Di meha îlonê de li marketan bihayên herî zede ji sedî 26,89’an firingî, bihayên herî kêm jî ji sedî 27,33 lîmon pêk aniye.
- Li Kirşehîrê Şevket Eker ji ber deynê xwe yê Kooperatîfa Kredî û Çandiniyê hacîz hat ser traktoroya wî ya li nav erdê. Wezerata Daristan û Çandiniyê îdia kir ku li Tirkiyeyê tu çewlig zirar nekirine.

**Rêwîtiya firingiyan**

- Ji bo firingiyên bi qalîteyeke di navberê de buhayê kîloyek firingî li ba hilberîner derdora 4.5 tl ye. Piştî ku mesrefên wekî 20 qurûş heqdestê karkeran, 1 tl ambalaj, kargêrî 40 qurûş, bac 4 qurûş wiha jî heta digihê halê buhayê wê dibe 6, 145 qurûş. Ji kîjan aliyê Behra Spî heta ku bigihê Stenbolê her kîloyek 30 qurûş neqliya wê heye, 15 hemal û 30 karê xwe davêjin ser dibe 6.90 qurûş lê zêde dibe. Piştî ku dighîje dezgehê 50 qurûş kargerî û 1 tl jî karê bazarvan lê zêde dibin lewre firingiyên ku bi 4.5 dikevin rê heta digihê dezgehan kîloya wan derdora 8.5 tê firotin. Ev buha li marketan zêdetir dibe.

**Buhayê berhemên çandiniyê yên meha Tebaxê**



- **Buhayê hin berhemên demsalî**

| Berhem Kg | Mersîn Zevî | Mersîn Hal | Mersîn Dezgeh | Stenbol Hal | Stenbol Dikan |
|---|---|---|---|---|---|
| Pirasa | 0,25-0,75 TL | 0,75-1,5TL | 3- 9 TL | 2-3 TL | 5-10 TL |
| Brokolî | 1-2 TL | 2-3 TL | 7-10 TL | 10-12 TL | 11-13TL |
| Kelem | 1-3 TL | 2-5 TL | 3-8 TL | 5-8 TL | 7-10 TL |
| Hinar | 1,50-3 TL | 3 -5,5 TL | 5-10 TL | 6-8 TL | 8-15 TL |
| Kereviz | 1-3 TL | 2-4 TL | 3-8 TL | 3-5 TL | 5-10TL |
| Kundirê şêraniyê | 0,25- 0,50 TL | 0,8-0,9 TL | 5-9 TL | 5-8 TL | 7-10 TL |
| Biyok | 1- 2 TL | 2-3 TL | 7-12 TL | 6-10 TL | 8-15 TL |
| Xox | 1-3 | 3-5 TL | 8-15 TL | 4-7 TL | 10-20 TL |

# Werin em ji bo cîhanek zindî plastîkê bikar neynin!

Li Tirkiyeyê di nava salekê de derdora 10 milyon ton plastîk tê hilberîn. Derdora 1 ji çaran ji van hilberînan tê hinardekirin. Yên mayî jî li Tirkiyeyê di sektrên cuda de tê bikaranîn. Bi taybetî di ambalaja berhemên xwarinê de zêde tên bikaranîn. Di nava civakê de wiha tê bawerkirin ku ev ambalajên plastîk ji alî tenduristî bi ewle ne û xurekan teze dihêlin. Lê rastiyeke wiha jî heye ku her madeyeke ji wan plastîkan ku tê bikaranîn zirareke mezin didin xwezaya me û ew nayên tunekirin û demeke gelekî dirêj di xwezayê de dimînin. Divê polîtîkayên wiha werin kirin ku di qadên cemawerî de ambalajên ku dîsa tên bikaranîn li şûna wan ambalajên plastîk ên ku zirarê didin xwezayê werin bikaranîn. Bê guman divê em hewl bidin ku van madeyên plastîk ji jiyana xwe ya tekakesî derxînin. Li vir em der barê mijarê de çend pêşinyarên rêxistina Greenpeace parvedikin ku hûn dikarin ji wan dest pê bikin.

